



Pirsên ku ji bo Parastina Navnetewî pirr tên kirin

Mafê kê bo penaberiye/parastina navnetewî heye?

Dewleta Yûnanîstanê (bi dayîna mafê penaberiye, staûya penaberiye-parastina navnetewî) hemwelatîyên welatên sêyemin an jî kesên bêdewlet ku ji ber sedemên nîjadî, dîn-ol, netew, tevlêbûna komeke civakî a taybetî, an jî ji ber ramanên siyasî, an jî welatê ku lê diman an jî welatê ku jê hatine xeteriyek mezin li ser wan heye ji ber kuştin an jî cezayê îdamê, îşkencekirin, an jî mûameleya nemîrovî an jî ji ber şerên navnetewî an jî şerên navxweyî bedena wan a yekperçeyî an jî jiyana wan di bin xeteriyê da ye, wan diparêze.

Ez çawa dikarim serî li mafê penaberiye bidim?

Hûn dikarin li Navendên Pêşwazî û Nasînê serî li mafê penaberiye/parastina navnetewî bidin. Heke hûn bixwazin li ser serlêdana we wê karmendên Navendên Pêşwazî û Nasînê wê we hewaleyî beşa Daîra mafê Penaberiye bikin.

Wekî din hûn dikarin serlêdana xwe bi rêya sepana elektronîk daxwaza xwe tomarbikin: <https://apps.migration.gov.gr/selfregistration/login>

Divê ez ji bo serlêdana mafê penaberiye peran bidim?

Na, gihîştina pêvajoya parastina navnetewî bêpere û serbest e.

Ez dikarim ji bo hevjin û zarokên xwe jî serlêbidim?

Hûn dikarin ji bo endamên malabata xwe jî serlêbidin heke ev jî dixwazin û li Yûnan in.

Berpirsiyarê doza min çawa biryar dide ka ez ê mafê penaberiye bistînim an na?



Berpirsiyarê dozê li gorî daxûyaniyên we ê hevpeyvînê, delîl û îspatê ku we ji bo serîlêdana xwe pêşkêşkirine, agahiyên di derheqê welatê we da û hemû agahiyên ku di dosya we da hene biryar dide.



Dema bo mafê penaberiye min serlêda û li benda bersiva xwe me ez dikarim sefer bikim?

Na, wek kesekî serî li parastina navnetewî daye hûn **nikarin** sefer bikin derveyî Yûnan. Tenê di bin şert û mercên taybet da bo sedemên însanî ku ji ber sedemên girîng ê tenduristiya we ku hatiye îspatkirin û divê hûn biçin welatekî din. Divê hûn serî li Daîra Mafê Penaberiye bidin ji bo ku pasaport derkeve. Heke hûn Daîra Mafê Penaberiye agahdar nekin û ji welat derkevin serîlêdana we tê betalkirin.



Pêwiste ez werger-tercuman bi xwe re bînim hevpeyvînê-heke ez bi îngilîzî nizanibim çi diqewime?

Daîra Mafê Penaberiye wê ji we re werger-tercumanê ku bi zimanê we diaxive an jî zimanê ku hûn jê fehmîkin peyda bike ji bo danûstandina we bi Daîra Penaberiye re.



Ez çawa dikarim fêrbibim ku serîlêdana min di çi qonaxê da ye?

Divê hûn an jî parêzerê we ê bi wekaletname werin Daîra Penaberiye, ji ber ku agahî bo dozên penaberiye bi telefonê nayên dayîn. Lêbelê ji ber ku rojane hêjmarek mezin kes tî Daîra penaberiye, em pêşniyardikin ku hûn dema qerta wê bidawî dibe (Kerta Serîlêdana Parastina Navnetewî) dema nuhkirina kerta xwe werin û wê çaxê hûnê ji bo doza xwe werin agahdarkirin.



Ez dikarim serî li mafê penaberiye bidim her çend ez li Yûnan ne neqanûnî/ne yasayî bim jî?

Erê, ji ber ku hûn bêqanûnî/bi qaçaxî ketine Yûnan ev nabe astengî ji bo gihîştina we a pêvajo û nirxandina serîlêdana we ya mafê penaberiye, tenê divê dema ku hûn ketine Yûnan di wexteke nêzîk da serî li mafê penaberiye bidin. Heke hûn bêqanûnî/bi qaçaxî ketine Yûnan û hûn **mecbûrî** li Navenda Pêşwazî û Nasînê dimînin, hûnê serlêdana xwe a ji bo Parastina Navnetewî li Daîra Mafê Penaberiye ku li nava Navenda ye bikin.

Heke ez ji hîjdesalî piçûktirbim ez dikarim serî li mafê penaberiye bidim?

Erê. Heke hûn di bin panzde salî da bin (15) serîlêdana we a parastina navnetewî dêûbavê we an jî kesê ku bo we berpirsiyar hatiye destnîşankirin wê daxwaz bikin. Heke hûn zarokê bêkes in kesê ku wek nûner bo we hatiye tayînkirin wê serlêdanê bo we daxwaz bike. Heke hûn ji panzde salî (15) mezintir in, hûn dikarin bi serê xwe serlêdana xwe bikin. Heke hûn zarokê bêkes in, rayedar wê ji bo we berpirsiyar tayîn bike daku ev kes te biparêzê û te li ciyekî bo zarokan mêvandar bike û ji bo serlêdana te a mafê penaberiye bibe alîkar.

Kesekî din dikare bi min re were hevpeyvînê alîkariya min bike?

Di hevpeyvînê da hûn dikarin parêzerê bi wekaletname, bijîjk-doktor, şewirmendê civakî an jî derûnnas-psîkolog bi xwe re bînin.

Dema ku ez li benda bersiva encama serlêdana xwe me, ez dikarim xwe bigêhijînim mafên tenduristiyê?

Erê. Ji bo ku mafê we ê gihîştina tenduristiyê û nexweşxanê hebe dema ku we serî li mafê penaberiye da hûn dikarin Hêjamara demkî a Sîgortê û Lênêrîna Tenduristiya Kesên Biyanî (PAAYPA) werbigrin.

Heke ez mafê penaberiye werbigrim ez dikarim derkevim derveyî welat (serlêdana min were pejiwandin)?

Dema ku statûya penaberiye we wergirt hûn dikarin daxwaza derxistina pasaportê bikin (TDV) lê hûn bi vê pasaporta penaberiye nikarin vegehin welatê xwe. Dema ku hûn statûya parastina duyemîn-însanî werbigrin dîsa hûn dikarin daxwaza pasaportê bikin, lê tenê dema ku Daîra Penaberiye zanibe ku tu nikarî ji welatê xwe pasaporta xwe a netewî werbigrî, tenê wê çaxê Daîra Penaberiye dikarin pasaportê ji te re derxînin.

Danayên kesane ku di hevpeyvîn/serlêdana xwe da didim, tên parastin?

Erê, hemû kesên ku beşdarî hevpeyvîn an jî serlêdana te dibin li gorî rêbaza veşartiyê tevdigerin. Daîra Penaberiye pabend dike ku ti agahiyekê ji serlêdana we nede rayedarên welatê we, lê agahiyan dikare bide rayedarên Yûnan.

Ez li ku dikarim yasaya bo mafê penaberiye li Yûnan bibînim?
Yasayên 4686/2020, 4636/2019, 4825/2021 ji bo parastina navnetewî



bi zimanê yûnanî di malpera Daîra Penaberiye da hatine weşandin.



Çi ferqa serlêderê mafê penaberiye û kesê ku hatiye naskirin wek penaber heye-di warên mafan da?

Serlêderê mafê penaberiye ew kesê ku xwediye Kerta Serlêderê Parastina Navnetewî ye ku bi qanûnî li welat dimîne û mafên ku pêwistiya wî pê heye bo danûstandina heta ku biryara serlêdana wî derdikeve. Mafên kesên xwediye parastina navnetewî û ên xwediye destûra rûniştinê wek mafên hemwelatîyên Yûnan in.



Heke serlêdana min were red kirin çi diqewime?

Hûn dikarin bêpere di asta-dereca dudiya li himberî Saziya Îstinafê ku lijneyek serbixwe ye, di nava dema ku di biryarê da hatiye nivisandin îtiraza biryarê bikin. Di vê merhelê da mafê we heye hûn alîkariya perêzeriyê bêpere werbigirin. Heke serlêdana we a parastina navnetewî di dawiyê da were redkirin, wê biryar were bicîkirin û hûn ji welat werin dersînorkirin.



Çiqas wext pêwiste bo prosedora serlêdana min heta ku biryara dawîn derkeve?

Bi temamî, li gorî rewşa we nîrxandina serlêdana we ji bîst (20) rojan heta şeş(6) mehan dikare li ber xwe bide.